## ***Taybetmendiyên Kenalên Ragihandinê yên Cûda***

| Kenal | Veguheztin/Gihiştin | Cureyên agahîyan | Asta têkiliyê | Lêçûn |
|---|---|---|---|---|
| **MEDYAYA WEŞANDINÊ** | | | | |
| **TV** | - TV dikare xwe bi lez û di heman demê de bigihîne gelek mirovan.<br>- Berhevkarîya hêmanên dengî û dîtbarî bandoreke mezin li temaşevanan dike<br>- Ew hewceyê elektrîkê û seta TV yê ne, ji ber vê yekê dibe ku dabînkirina wan li deverên kêm-dahat sînordar be.<br>- Temaşevan dibe ku ji bajaran bêtir xelkên gundewaran bin.<br>- Gihîştin bi kanala belavkirinê ve girêdayî ye (erdî, satelayt, kablo)<br>- Ji bo danûstandina bi komên mezin ên niştecîhan re guncav e.<br>- Xwe digihîne civakên ku gihîştina fizîkî ber bi wan ve dijwar e an jî ne gengaz e | - Peyamên hêsan dikarin bi ragihandinên servîsa giştî (PSA) an jî peyamên ku ji hêla pêşkêşvanekî ve tên xwendin, bên şandin<br>- Peyamên tevlihev dikarin bi bernameyên taybet, drama, talk show(bernameyên nîqaşê), agahîyên xweş(infotainment) bên şandin. | Dikare bi temaşevanên stûdyoyeke zindî re înteraktîf be an jî heger temaşevan di pêşandaneke zindî de bang bikin an peyameke nivîsê bişînin. | - Lêçûna hilberînê ji radyoyê zêdetir e<br>- Ji bo bernameyên sponsorkirî lêçûna dema weşanê bo demeke dirêj ji radyoyê bilindtir e |
| **Radyo** | - Dikare bi lez û di heman demê de xwe bigihînin hejmareke zêde ya mirovan ku ji hemû komên dahatê pêk tên.<br>- Piranîya setên radyoyê biçûk û sivik û mezin in û heke hêzeka sereke ku elektrîkê dabîn dike tune be dikare li ser bataryayan bixebite.<br>- Xwe digihîne civakên ku gihîştina fizîkî ber bi wan ve dijwar e an jî ne gengaz e<br>- Ger îstasyonên herêmî hebin, bi agahiyên têkildarî herêmê re dikare civakên piçûk bike armanc<br>- Bi civakên devkî re xwedan têkiliyeke baş e<br>- Navgînek hêsan e ji bo bi zimanên herêmî re têkiliyan deynin | - Peyamên hêsan bi riya PSA an skrîptên ku ji hêla pêşkêşker ve têne xwendin<br>- Peyamên tevlihevtir dikarin bi bernameyên taybet, bernameyên nîqaşê(talk show) û dramayan bihên veguheztin. | Asta bilind a têkiliyê gengaz e. Ev dikare bi nîqaşeke zindî an bernameyeke nîqaşê ya bi navgîna têlefonkirin an jî nivîsînê ve were pêk anîn. Her wiha xwendin û bersivdayîna nameyên guhdarvanan jî mimkûn e. | - Lêçûnên ji yên TV-yê kêmtir .<br>- Ji bo bernameyên sponsorkirî lêçûnên dema weşanê ji yên TV-yê kêmtir in. |
| **DVD** | - Berhevkarîya hêmanên dengî û dîtbarî bandoreke mezin li temaşevanan dike | - Dikare peyamên hêsan an jî tevlihev pêşkêş bike. | Heger di warê civakî de ku tê de | - Lêçûna zêde ya hilberînê.<br>- Lêçûna belavkirinê bi |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| | - Xwe dispêre belavkirina fîzîkî ya DVD yê.<br>- Rûmalkirin bi çend DVD yan ve girêdayî ye ku dikare were hilberandin/belavkirin<br>- Ji bo lîstinê pêdivî bi 'DVD player' an komputerekê û bi dabînkirina elektrîkê heye<br>- Dikare ji bo armancên taybet an jî giştî were çêkirin. | | paşê nîqaş an jî Pirs(Q) û Bersiv(A) hebin were bikaranîn dikare pir înteraktîv be | hêsanbûna gihîştina fîzîkî ya bi gîrseyên armanckirî re girêdayî ye |
| **Hoparlorên deng bilind** | - Rûmalkirin bi gihîştina fîzîkî ve girêdayî ye.<br>- Baş e ji bo armanckirina komên serjimara wan gelekî bilind ên ku li gundên mezin, deverên bajarî, an kampan kom bûne.<br>- Hoparlorên deng bilind dikarin statîk (mînak bazar an mizgeft) an jî mobîl (megafona desta an jî hoparlor) bin.<br>- Dikare peyamên rasterast bîne nav dilê civakê.<br>- Bêyî radyo û televîzyonê xwe bigihînin komên mirovan<br>- Weşandina peyaman bi zimanên herêmî hêsan e | - Ji bo peyamên kurt ên hêsan guncavtir e.<br>- Dikare her peyam û zimanî li gor herêman biguncîne | Sînorkirî. Ji bo nirxandina bilez kanaleke fermî tune ye | - Erzan |
| **MEDYAYA ÇAPKIRINÊ** | | | | |
| **Rojname** | - Belavkirina kopîyên kaxizê bi gihîştina fîzîkî û hebûna kanalên belavkirinê yên berhemdar re têkildar e.<br>- Guhertoya online dikare bilez bigihîje mirovan ji ber ku girêdana înternetê li her deverê heye.<br>- Ji bo danûstendina bi komên mezin ên mirovên xwende re li deverên nifûsa pir zêde baş e.<br>- Belavkirina li gundewaran zehmet e<br>- Heman nivîs dikare di nava demekê de ji aliyê gelek mirovên cuda ve bê xwendin û dubare bê xwendin. | - Peyamên hêsan an jî tevlihev<br>- Dîmenên dîtbarî dikarin piştgirî bidin nivîsê - wêne, karton, grafîk. | - Çarçoveyeke sînorkirî ya rojnameyên ku wekî nusxeyên kaxezê têne belav kirin. Xwendevan dikarin bi rêya nameyan nirxandinan bişînin.<br>- Guhertoya online dikare bi hêsanî şîrove û nûvekirinên agahdariyê, wêne û vîdyoyan ji xwendevanên ku înterneta wan heye werbigire. | - Reklam û gotarên sponsorkirî li gorî mezinahî û tîraja rojnameyê dibe ku giran bin.<br>- Peyam heke bi rengê nûçeyan werin parvekirin dikarin bêpere werin belavkirin. |
| **Belavok** | - Dikare li cihên ku hatine armanckirin bi awayekî zêde bê belavkirin.<br>- Gihîştina fîzîkî bi civaka armanc bo belavkirinê hewce | - Dikare ji bo ragihandina agahîyên tevlihevtir bê bikarînan.<br>- Dikare peyaman bi wêne, | Sinorkirî | Hilberandina wê erzan e, lê belavkirina wê dem dixwe û dibe ku bihayê |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| | ye<br>- Heta ku peyam bi zelalî di wêneyan de neyê veguheztin bandora sînordar li ser niştecihên kêm-xwende | dîyagram û kartonan ra bike yek. | | wê giran be. |
| **Bîlbord** | - Dê bigihîje gelek kesan heger bîlboard li cihekî baş were danîn ku gelek kesên di nav gîrseyên armanckirî de dikarin wê bibînin. | - Divê peyam sade be û xwedî bandoreke demdirêj be.<br>- Dikare nivîsê bi wêneyan re bike yek | Ne yek jî | Lêçûn bi piranî bi mezinahî û cîhî ve girêdayî ye |
| **Poster** | - Rûmal dikare baş be heke poster bi berfirehî werin belavkirin û li cîhên guncan werin danîn da ku gîrseyên armanckirî bikarin wan bibînin.<br>- Ji bo belavkirina li herêmên asê dem dixwe.<br>- Belavkirin bi gihîştina fîzîkî ve girêdayî ye | - Ji bo peyamên hêsan baş e.<br>- Ji bo nifûsên nexwendewar dikare bi bikarinana wêne/dîyagraman bê guncandin | Ne yek jî | Bi nisbî erzan e |
| **Lewheya ragihandinê** | - Rûmala erdnîgarî ya sînorkirî.<br>- Lokasyon bi gelemperî li deverên girtî yên wekî kamp an jî niştecihgeh an jî gundên biçûk in.<br>- Rêyeka baş e ji bo parvekirina agahîyên ku bi giranî têkildarÎ herêmê ne. | - Ji bo peyamên hem hêsan hem jî tevlihev baş e.<br>- Dikare nivîs û wêneyan bi kar bîne.<br>- Nûvekirina wan hêsan bi materyalê nû hêsan e lê karekî zehmet e.<br>- Ji bo civakên ku beşeke mezin a mirovên wê xwende ne, guncav e | Civak dikare peyamên nirxandinê par ve bike (li ser têxteyên agahdarîyê an jî di qutîyên pêşnîyarên ku dikarin pê ve bihên girêdan de) | Pir erzan e |
| **TELEFONÊN DESTAN** | | | | |
| şandina SMS bi carekê | - Rûmala berfireh.<br>- Bi lez û hêsan.<br>- Ew hewce dike înterneta mobîl hebe, ku dibe ku li hin deverên dûr sînordar be.<br>- Di koma mirovan ya armanckirî de hebûna telefona desta(mobîl) berfireh hewce dike.<br>- Bandora Sînorkirî di civakên kêmxwende de<br>- Di demên pevçûn an jî tengezariyên siyasî de dibe ku hikûmet şebekeyan bo demeke kurt bigire. | - Peyam divê sade be û bi 160 karakteran were sînordarkirin.<br>- Ji bo agahîyên nihênî ne guncav e. | Heta ku tû nikaribî bi lez û bez bersivê bidî nirxandinên li asta bilind, sînordar e | - Lêçûn bi pirhejmariya bikaranîna xercên ku ji hêla gerînendeyê torê ve hatî barkirin ve girêdayî ye. Dibe ku carinan peyamên xwedan pêşîniya bilind belaş werin pêşkêş kirin |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| SMS-a armanckirî | - Ji aliyê erdnîgarî ve hatiye armanckirin.<br>- Bi lez û hêsan.<br>- Lîsta hejmarên têlefonê yên kesên armanckirî hewce ne<br>- Di demên pevçûn an jî tengezariyên siyasî de dibe ku hikûmet şebekeyan bo demeke kurt bigire. | - Peyam divê sade be û bi 160 karakteran were sînordarkirin. | Dibe, heger nirxandin were xwestin. Lê belê, ev tenê heke hûn xwediyê kapasîteya ku hûn bi lez û bez bersiv bidin peyamên ku hûn werdigirin tê pêşniyar kirin. | - Lêçûn girêdayî hejmara wergiran û dayîna peyamên(SMS) herêmî ye.<br>- Heke bi şîrketên mobîl ra bixebitin, dibe ku lêçûnên wan bihên kêmkirin |
| **ÎNTERNET** | - Pêdivîya wê bi înterneteke berfireh û bikaranîna online bi rêjeyên bilind heye<br>- Bi jêrxana telekomê ve girêdayî ye<br>- Bikarhênerên înternetê bi giranî mirovên xwende, yên dahata wan bilind û bajarî ne<br>- Li herêmên gundewarî ku kêmdahat in gihaştina bi mirovan kêm e.<br>- Ji bo danûstandina bi komên kêmxwendewar re ne guncav e.<br>- Vebijêrka agahîyên pasîf (malper).<br>- Vebijêrka agahiyên çalak (email).<br>- Kanalek baş e bo meriv xwe bigihîne dîasporayê | - Ji bo peyamên hem hêsan hem jî tevlihev baş e.<br>- Vîdyo, wêne û deng bi nivîsê re girê bide. | Dibe ku pir înteraktîv be. | - Çêkirin û nûvekirina malperekê bilez û hêsan e, lê ji bo amadekirina naveroka malperê û berdewamkirina belavkirina agahîyan, hejmareke mezin ji karmendên pispor hewce ne. |
| **RÛ BI RÛ** | | | | |
| Perwerdekarên hevtayan, xebatkarên civakî, xwebexş | - Gelek dem û ked jê re divê.<br>- Pêdivî ye ku hejmareke mezin ji mirovên ku gihîştina wan ya fizîkî bi civaka armanc hene | - Rûbirûbûn şêweyê herî xurt û îqnaker ê ragihandinê ye.<br>- Ji bo berdêlkirina agahîyên tevlihev ku li gorî hewcedarîyên kesan e, baş e.<br>- Dema ku ragihîner ji hêla civaka armanc ve were naskirin û hurmet jê re were nîşandan herî baş dixebite.<br>- Xetereya berovajîkirina peyamê ji ber ku peyamner xirab in an jî xwedan bernameyeke veşartî ne. | Têkilîya bi nirxandineke lezgîn re. | - Dibe ku buhayê wê giran be.<br>- Lêçûn dikare perwerdehî, veguhastin, alav û meaş/teşwîq di nav xwe da bihewîne. |
| **MEDYAYA KEVNEŞOPÎ** | | | | |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Şano , civînên civakê , stranb , dîlan , helbest | - Rûmala erdnîgarî ya sînorkirî.<br>- Ger derfeta we ya gihîştinê hebe, ev ji bo civakên ku gihîştina bi wan dijwar e baş e. | - Ji bo peyamên hêsan, bi hêsanî têne fêm kirin baş e.<br>- Ji bo bilindkirina hişmendiya civakê li ser mijarên hesas bi rengekî kêfxweşker baş e. | Ger destûr ji temaşevanan re were dayîn ku di dema performansê de an di dawiya performansê de beşdar bibin, têkiliyeke bibandor dikare were saz kirin. | - Lêçûn girêdayî mezinahîya koma xebatkir, alozbûna hilberînê û dûrahiya di navbera cihên xebatê de ye. |